


# Can Yücel (1926-1999)

Amadekar:

Mahmûd Lewendî

Şaîr û nivîskarê Tirk Can Yücel di 1926'an de li Îstenbolê ji dayik bûye. Kurê Hasan Alî Yücel e. Li Ankarayê di DTCF (Fakulta Ziman, Tarîx û Cografyayê) de beşê Filolojîya Klasîk xelas kiriye. Piştê li Îngiltereyê di Unîversîteya Cambridge de xwendîye. Demekê li Londrayê di radyoya BBC de kar kiriye. Piştî ku vegeyriyaye Tirkîyê li Bodrumê ji bo tûristan rehberî kirîye, paşê li Îstenbolê bi cîh bûye û di karê wergerê de jiyana xwe domandiye. Helbest, werger û nivîsên wî bi piranî di kovarên *Yenilikler*, *Beraber*, *Seçilmiş Hikayeler*, *Dost*, *Sosyal*, *Adalet*, *Şiir Sanatı*, *Dönem*, *Yön*, *Ant*, *Imece*, *Papirüs*, *Yeni Dergi*, *Birikim*, *Sanat Emegi*, *Yazko Edebiyat* de derketine.

Piştî salên 1965'an Can Yücel dest bi nivîsên sîyasî jî dîke. Wî di helbest û nivîsên xwe de bi piranî ironîzm, "mîzaha reş" û



Can Yücel

hîciv bi kar anîye.

Berhemên wî: *Yazma* (1950), *Sevgi Duvarı* (1973), *Bir Siyasinin Şiirleri* (1974), *Ölüm ve Oglum* (1976), *Şiir Alayı* (1981), *Rengahenk* (1982), *Gökyokuş* (1984)

Her çendî wergerandina helbestan zehmet e. Û tew bi ser de Şaîr jî Can Yücel be, zehmettir dibe, lê dîsa jî me hewl da xwe, me çend helbestên wî ji Tirkî wergerandin.



### XIYARARŞÎ

Ez dibêjim "xiyar"  
Dibêje, "na, ez turşî me!"  
**HELA BINÊRE!**

Her tişt buye xurde  
Lê dîsa jî li ortê perê xurde  
tuneye!

12 Adar 1980

### ŞITIFÎN\*

Dema ku bi tenê dimînim ez,  
Yanê gava ku Güler ji min  
direve

Hemû lambeyan vêxistî dihêlim  
bîst û çar saet

Du radyo hene, herduyan jî  
vedikim ez

Nanekî tam dikirrim li şûna nîv  
nanî

Û "Îro mastekê mezin bide min"  
dibêjim ji dikandar re

Yê ku bibîne wê bibêje qey  
dawet heyê!

\*Şitîfîn: Di maneya "kaçamak" a  
tirkî de hatiye bikaranîn.

### JI DEVÊ KURT AHMED\*

Bavê min bi rastî zîrek bû  
Ez ê di demeke herî nêz de xelas bim  
lawê min! digot

Ji vê cehaletê

Ezê xelas bim, lê

Ku şûna wê bi tiştêkî din danegrîm?

\*Kurt: Gur

### JI MERE JÎ DIBÊJIN ÇEQOKÊŞ

Her tim tebeşûr di bêrika min de  
ye

Dema ku li kolaneke mûtena  
Li ser deriyê baxçeyê koşkekê  
Rastî wê lewha

Dîqqet (du nuxte li ser hev)

DI VÊ MALÊ DE

KÛÇIK

HEYE

têm, bi herfên mezin

RASTE

Dinivîsim.

### Çavkanî:

-Kurdakul, Şükran; Şair ve  
Yazarlar Sözlüğü, 1985, İstanbul,  
r. 669

-Batur, Enis; Kara Mizah  
Antolojisi, 1987, İstanbul, r. 148

-Yazko Edebiyat, (kovar),  
İstanbul, No: 10 (1981)